

Bi Rihê 8'ê Adarê û Newrozê Bijî 1'ê Gulanê



بروح 8 آذار ونوروز يعيش 1 أيار



2 ROJEV: *Li Dijî Mêtîngeriya
Kapîtalîst û Dagirkeriyê Bijî 1'ê Gulanê!*

6 اجندة: الجري نحو الصباح

3 JIN: *Em ê Bi Hêza 8'ê Adarê
û Newrozê 1'ê Gulanê Bi Dest Bixin*

9 تاريخ: مصابيح مهباد

5 JÎYAN: *Ne Erdhejê Pergala Kedxweriyê Ya
Kapîtalîzmê Kuşt*

9 قيم: من الرفيق باران إلى الرفيق أحمد الشيوعي

Li Dijî Mêtîngeriya Kapîtalîst û Dagirkeriyê Bijî 1'ê Gulanê! Bijî Sosyalîzm!



Me sala 2023'ê bi tevgerê mezin a binerd û sererd pêşwazî kir.

Bajarên Bakur û Rojavayê Kurdistanê, Tirkiye û Sûrî di encama erdhejê ku navenda wê Mereş bû rûxaneke mezin jiyana kir. Bi deh hezaran kesan jiyana xwe ji dest da. Sedema mirina bi deh hezaran mirovan ne erdhej e. Sedema esasî çavsoyî qezencê ya kapîtalîzmê ye. Dîkdatoriya AKP û MHP weke esas bi salana ji pîşesaziya şer xwedî dibe. Ji qezencên ku ji Helep û Efnê diziye li Mereş û Dîlokê qadên nû yên kedxwariyê avakirin. Çawa bû ku nifûsa Mereş û Hatayê du qet zêdetir bûye. Bi şer û dagirkeriyê di aliyekî de bi milyonan mirov ji cihên xwe hatin koçberkirin, di aliyê de din ew ji bo dewleta Tirk kirin hêza erzan a kar. Di aliyê din de demografiya bajarên Kurd hat guhertin. Dîkdatoriya AKP-MHP dixwazin vê erdhejê bikin derfet li herêmên erdhejê nifûsa Kurd û Elewî belavela bikin. Ji ber vê yekê bi rojan bi hezaran kes terikandin mirinê.

Ber Bi 1'ê Gulanê Ve...

Li Kurdistanê îsal wateyeke 1'ê Gulanê ya cuda heye. Îsal salvegera 100'emîn ya Lozanê ku weke xencereke ku çikiliyaye dîroka me ye. Welatê me yê ku di sala 1639'an di bi hevpeymanî Kasr-ı Şirin hatiye 2 parçekirin bi hevpeymanî ku berî 100 sal ji aliyê Fransa, Îngîlîstan, Îtalya û Tirkiyê ve hat îmzekirin vê carê hat kirin 4 parçe.

Eynî wekî berî 100 sal îro jî emperyalîst li dijî weke nasnameyek îradebûna Kurdan in. Di şertên qeyrana hebûnî ya kapîtalîzmê de avabûna şoreşê xwedî xisleta şoreşger, demokratîk û gelparêz ji bona xwe weke gefeke mezin dibînin. Li dijî rastiya gelekî xwedî artêş û bisîleh bi dijminatîyê mezin weke stratejîk û taktîk şer vekirine. Nêzikatiyên itifaqa taktîk a Emerîka û hêzên koalîsyonê ya bi Rêveberîya Xweser û QSD'ê re divê kesî nexapîne. Tu qîmeta Kurdan ji ber Kurdbûna xwe Ji bona Emerîka û Rusyayê tune ye. Encax ji bona

wan dema ku serweriya emperyalîst a herêmê û berjewendiyên xwe dibin gotina mijarê wateya Kurdan û gelên bindest heye. Hevdîtina li Moskowê ya Tirkiyê, Rûsya, Sûrî û Îranê jî ji ber berjewendiyên xwe yên emperyalîst e.

Maseya Moskowê maseyeke ku li hemberî gelên Rojava û Sûrî hatiye avakirin e, maseyeke ku li hemberî yekîtiya wekhev a dildar a gelên Bakur û Rojhilatê Sûrî û bawerîyan hatiye avakirin e, maseyeke ku li hemberî itifaqa stratejîk a gelê Erebi û Kurd hatiye avakirin e. Pûtîn ji bo serweriya Sûrî û herêmê pêwîstî bi şefê faşîst Erdogan dibîne û dixwaze emrê dîkdatoriya wî dirêj bibe. Yek ji wateya hevdîtinên Moskowê jî ev e. Di salvegera 100'emîn de şoreşa Rojava li hemberî polîtîkayên emperyalîst ên herêmê de şkestinek afirand. Em ê vê şkestinê bi têkoşîna xwe ya Kurdistaneke azad, serbixwe û yekbûyî û bi têkoşîna xwe federalîya sosyalîst a Rojhilata Navîn vegeştinê têkçûna wan. Bersiva welatparêzên sosyalîst a li dijî sofreya guran a ku li Moskowê hatiye avakirin ev e!

Em Bi Coşa 8'ê Adarê û Newrozê Bi Biryardariya têkoşînê Ber Bi 1'ê Gulanê ve Dimeşin

Tevgera Komûnîst a Şoreşger (TKŞ) a ku bi salan e li vê erdnigariyê di nav têkoşînê de mafa hebûnî bi dest xist, Ji bo ku têkoşîna gelên Kurd, Erebi, Ermen, Suryan, Tirkmen, Asûrî, Êzîdî û tevahî karker û kedkarên herêmê nîqaş bike û ji bo destgirtina pîrgêrêkên di milê yekîtiya karkeran de bi dirûşmeya "Li Dijî Pergala Kedxwarî û Mêtîngehiyê Bijî 1 Gulan Bijî Şoreşa Me ya Rojava" sempozyûmekê rêxistin dike.

Hêzên emperyalî çaresariya qeyrana xwe ya hebûnî di hîna zêdetir şer û dagirkeriyê de dibînin. Li dijî ev qeyrana kûrewîbûna emperyalîyetê di sedsala 21'emîn de yek ji bersivên bindestan jî şoreşa Rojava ye. Avakirina hebûna xwe ya netewî û bidestxistina azadiya polîtîk ji bo gelê me destkeftineke stratejîk e. Ji ber vê yekê

şoreşa me ya Rojava ji bo gelên cîhanê bangewazî û pratîka "şoreş û serkeftinê" ye. Parastina şoreşa Rojava û ji bona vê hîna zêdetir şerkerin, li dijî kapîtalîzmê, erka zêdekirina mewziyên karker û kedkaran e. Divê ev meşa serkeftinê bi têkoşîna li dijî sermiyanê ve bibe yek. Welatparêzên sosyalîst xwe li gorî du erkên parastina şoreşa Rojava bi cih dikin. A yekemîn li dijî mêtîngeriya û dagirkeriyê parastina welat û ji bona vê jî bi tevahî welatparêzan ve meşandina têkoşîneke hevbeş. A duyemîn rêxistinîna têkoşîneke hevbeş a tevahî netew, bawerî, çîna karkeran û kedkaran ku tevahî şoreşên sosyalîst ên herêmê û cîhanê ava bike. Misogeriya şoreşa me ya Rojava şoreşên sosyalîst ên herêmê û cîhanê ne. Sosyalîzm tena di pêşengtiya tevgerê ku xwe bi zanebûna çînî dorpeç kiriye dikare pêş bikeve. 1'ê Gulanê di nav bîskên qewastinê yên çînî de xwedî wateyeke taybet û xweser e. Yek ji kêliyên herî taybet a ku lêdana sosyalîzmê ya li dijî kapîtalîzmê, weke dîrokî û rojaneyî zanebûna çînî şênber dibe ye.

Li Sûrî di pêşengtiya Komûnîstan de yekemîn 1'ê Gulana legal (zagonî) di 1'ê Gulana 1925'an de hatiye pîrozkirin. Taybetmendiyêke vê dîrokê ya wiha heye ku di sala 1925'an de 1'ê Gulanê tevahî rêxistinên komûnîst aniyê gel hev. Di salên piştê de bi siyaseteke taybet a BAAS 1'ê Gulanê ketiye bin kontrola BAAS û di milê pêşxistina hêza xwe ya serbixwe qels maye. 1'ê Gulanê derveyî rojêke têkoşîna karker û kedkaran weke rojêke seyranê hatiye girtin dest û naveroka wê ya polîtîk hatiye valakirin. Ev di heman demê de qelsiya tevgera çîna karkeran a li erdnigariya me ye. Di ev şertên kûrewîbûna emperyalîyetê de derfetên heyberî yên şoreşa herêm û cîhanê mezin bûn e. Li vir erka ku dikeve ser milê komûnîstan rêxistinîna yekîtiya tevahî karkerên cîhanê û netewên bindest e. 1'ê Gulanê weke roja yekîtiyê, têkoşîn û piştgiriya navneteweyî ya çîna karkeran ala vê bangewaziyê ye. Welatparêzên Sosyalîst wê sempozyûma 1'ê Gulanê û pêvajoya 1'ê Gulanê bi vê bergehê rêxistin bikin. Li vê erdnigariyê li dijî êrîşên taybet ên ku tune kirina tevgera şoreşger û komûnîst hedef digire wê Tevgera Komûnîst bi armanca hîna zêdetir rêxistinîna karker û kedkaran sefer bibe. Ji bona ku di 1'ê Gulanê de karkeran, kedkaran, jinan ciwanan weke artêşêke siyasî bi cih bikin wê tevahî keda xwe hîna zêdetir bixin holê. Em di fermandeya rêberên damezrêner ên xeta welatparêziya sosyalîst Baran Serhad û Ehmed Şoreş de bi rihê seferberî ber bi 1'ê Gulanê ve dimeşin. Em ê bi ser bikevin!

Em ê Bi Hêza 8'ê Adarê û Newrozê 1'ê Gulanê Bi Dest Bixin

Me 8'ê Adara 2023'an li paş xwe hişt. Li Kurdistanê jinan seriyê têkoşîna li dijî mêtîngeriye, êrîşên dagirker ên faşîst û têkoşîna li dijî serweriya mêr kişandin. Şoreşa Rojava di heman demê de weke şoreşeke jin di 8'ê Adara 2023'an de weke bangeweziyeke "min biparêze û bide jiyandin" bû girîngiyeke dîrokî. Rojava ya ku di sala 2027'an de bibe cihê konferansa 3'emîn a jinên cîhanê, di vê 8'ê Adarê de careke din nîşan da ku mewziyekî herî xurt ê jinan e.

Li tevahî bajarên şoreşê di berfirehiya 8'ê Adarê de çalakî hatin lidarxistin. Minbic, Kobanê, Qamişlo, Heskê cihên herî girseyî bûn, bi hezaran jin tevî van çalakiyan bûn. Di vê 8'ê Adarê de itifaqa Kurd, Erebi û gelên bindest derket pêş û êrîşên dagirkeriyê di rojeva jinan de bû, silavkirina YPJ'ê û şiyara "Jin Jiyan Azadî" rojevên bingehîn bûn. Çalakiyên 8'ê Adarê li Reqa û Tebqeya ku ji dagirkeriya DAÎŞ'ê hat rizgarkirin destpê kir. Li dijî êrîşên dagirkeriyê û serweriya zilam tevîbûna bi sedan jinên Erebi gelekî girîng bû. Jinên Komûnîst ên Şoreşger (JKŞ) li çar bajarên bingehîn ên weke Kobanê, Dirbêsiyê, Heskê û Kobanê bi lafiteyên "Jin Jiyan Azadî-Bijî Berxwedan", bi al û dirûşmeyên xwe bi awayekî çê di van çalakiyan de cihê xwe girt û bi girseyeke biryardar û bi çê bal kişand.

Li Başûrê Kurdistanê 8'ê Adara herî girseyî bi tevîbûna hezaran li Mexmûrê pêk hat. Li Şengal û Silêmaniyê daxuyaniyên girseyî hatin lidarxistin. Li Qadên Parastina Medyayê gerîlayên Rêxistina Jinên Komûnîst a MLKP'ê û YJA Star di mewziyan de li dijî pergala kapîtalîst û êrîşên dagirkeriyê çalakiyên 8'ê Adarê lidarxistin. Gerîlayên jin di 8'ê Adarê de bûn denga jinên azad. Li Bakurê Kurdistanê pergala kapîtalîst a zilamperest, qetlîamên jin, jenosîda netewa Kurd, berxwedana li dijî dagirkeriyê rojevên bingehîn ên 8'ê Adarê bûn. Bi tevîbûna herî girseyî ya 8'ê Adarê bajarê

Wanê bal kişand. Jinan li Amedê bi çalakiya rûniştina li ber qelaçeyên polîsan sekneke bi biryar pêşkeş kirin. Li bajarên Tirkîye hêrsê li dijî dewleta Tirk a burjuva û Erdogan ku erdhej vegeandin komkujiya gel, berxwedana li dijî polîtakayên faşîst ên zilamperest û têkoşîna li dijî xizantî, bêkarî, bihabûn, mêtîngeriya kedê, qetlîamên jin li gelek bajarên bû rojeva 8'ê Adarê. Stembol bi tevîbûna hezaran jinan cihê herî girseyî bû. Jinên ku li Stembol û Enqereyê zor dan qelaçeyên dijmin bangewazî kirin ku hikûmetê ku erdhej vegeandin komkujiya gel îstîqala xwe bidin. Dirûşmeya "Em bêdeng namînin, natirsîn, serê xwe natewînin" qîr kirin.

Li seranserî cîhanê 8'ê Adarê di pêvajoyeke serhildanê gel ên li dijî qeyrana aborî û siyasî ya dewletên burjuva hat pêşwazî kirin. Mêtîngeriya kedê û tundiya zilam-dewlet îsal bûn du mijarên ku mohra xwe li 8'ê Adarê xist. Li Srîlankayê jinan bi tevîbûneke têkoşer û girseyî qelaçeyên polîsan derbas kirin. Li Fransaya ku cihê herî girseyî bû li 150 bajarên jin derketin kolanan. Berî 8'ê Adarê bi tevîbûna 3,5 mîlyon kesan li dijî bilindkirina temenê teqawidiyê girêva giştî hat lidarxistin. Li Yewmanîstanê 60 hezar kes derket kolanan û polîtîkayên hikûmetê şermezarkirin. Li tevahî dewlet û bajarên Emerîkaya Latîn jin derketin kolanan û di çalakiyên li dijî zilamperestiyê daxwaza wekhevî û azadiyê kirin. Ji Emerîka heta Îtalyayê, ji Elmanyayê heta Îngîlîstanê, Ji Awîstralyayê heta Beljîkayê, Ji Japonyayê heta Kirgîzîstanê, Ji Qazaxîstanê heta Ermenîstanê, Ji Bosnayî heta Fînlandiyayê û Nemsayê û gelek dewletên ku em nikarin navên wan bijmêrin jinan çalakiyên 8'ê Adarê lidarxistin. Di Newrozê de li çar parçeyê Kurdistanê û gelek welatên Rojhilata Navîn û Ewropayê jinên Kurd, Ermen, Erebi, Suryan, Tirk û HWD. bi mîlyonan jinan bi hêza 8'ê Adarê agirê Newrozê geşkirin û careke din nîşan dan ku

tu hêz nikare vîna jinan bişkîne. Li seranserî cîhanê tevgerên jin her ku diçe hîna polîtîktir dibin. Nakokiyên navbera dewletên burjuva û bindestan, jinan û serweriya zilamperest hîna zêdetir û kûrtir dibin. Li dijî tevahî sazîyên serweriya zilamperest di rêya bidestxistina zanebûna siyasî de pêş ve diçin. Di 8'ê Adarê de serhildana jinan a li dijî zilamperestiyê nîşan dide ku wê di demên pêş de têkoşînen navbera jinan, gelên bindest û dewletên burjuva de hîna hişktir bibe.

Li dijî pergala emperyalîst ên kapîtalîst bi girseyî tevîbûna jinan a tevgerên kedê, derketina pêş a jinan di berxwedanên karker û kedkaran de balkêş e. Ji ber van sedeman 1'ê Gulana 2023'an di seranserî cîhanê de wê bibe rojeke ku jin hîna zêdetir derdikevin pêş. Jinên ku bi girêvên giştî, berxwedanên karker û kedkaran, bi çalakiyên ku zor dan qelaçeyên polîsan 8'ê Adarê pêşwazî kirin wê 1'ê Gulanê bi tevgerên kedê yê ku mezin dibin pêşwazî bikin.

Em li Rojava jinên kedkar ên ku di nav malan de kedê diafirînin û pêkhatiya herî mezin a keda jinê ye banga girevê û di 1'ê Gulanê de banga qadan dikin. Em di wê rojê de karên paqijiyê, çêkirina xwarin, xwedîkirina zarokan biterikînin û tevî 1'ê Gulanê bibin. Bi awayekî xurt tevî "sempozyûma 1'ê Gulanê" ku TKŞ rêxistin dike bibin. Li dijî mêtîngeriya kedê û li dijî êrîşên ambargoya aborî û dagirkeriyê yê dewletên emperyalî û dewletên paşverû yê herêmê divê di 1'ê Gulanê de tevahî jin dakevin qadan. Avakirin û parastina şoreşa me ya ku di bin dorpeça dewletên emperyalî yê navneteweyî û dewletên zilamperest de ye mijara bingehîn a 1'ê Gulanê ye. Em ji bo Kurdistanê Azad, Serbixwe û sosyalîst û ji bo Rojavayeke sosyalîst derkevin qadan û xwedî li keda xwe derkevin û di çalakiyên 1'ê Gulanê de di refên herî pêş de cihê xwe bigirin.



Komûnîstên Rojavayî: Em ê Rêheval Baran Di Têkoşîna Xwe de Bidin Jiyandin

Komûnîstên Rojavayî di 4'emîn salvegera şehadete de rêberê komûnîst Baran Serhed bi bîr anî. Di bîranên ku li Qamişlo, Dirbêsiyê, Kobanê û Hesekê hatin lidarxistin de hat gotin ku "Em ê Rêheval Baran di Têkoşîna Xwe de Jiyandin".

DIRBÊSIYÊ

Li Dirbêsiyê bîranîn li bînayeta TKŞ'ê hat lidarxistin û cihê bîranînê bi sûretên şehîdan hat xemilandin û lafiteya bi dirûsmeya "Rêberê Komûnîst ê Şoreşa Rojava Baran Serhad Nemir e" hat daliqandin. Bîranîna ku di şexsê şehîdan de bi deqek rêzgirtin destpê kir bi pêşkeşkirina sînowîzyona derheqê Baran Serhed de berdewam kir.

Li ser navê komûnîstan Feyrûz Abdûlah axivî. Feyrûz Abdûlah di axaftina xwe de bal kişand ser rola Baran Serhed a di şoreşa Rojava de. Feyrûz Abdûlah axaftina xwe wiha domand "Rêheval Baran jiyana xwe nezirî sosyalîzmê, rizgariya çîna karkeran û azadiya gelê me yê Kurd kir. Bi şoreşgertiyeke bêsekn têkoşin kir. Ew nûnerê herî baş ê nifşa serkeftinan e.

Feyrûz Abdûlah bi bîr xist ku Baran Serhed bi coşeke mezin şoreşa ku li Rojava destpê kir pêşwazî kiriye wiha wiha berdewam kir "Ger ku îro em dibêjin em ê rêheval Baran di têkoşîna xwe de bidin jiyandin divê em erkên parastin, pêşxistin û berfirehkirina şoreşê û erkên birina şoreşê ber bi şoreşeke sosyalîst ve bi serkeftî pêk bînin." Bîranînê bi axaftinên kesên ku rêheval Baran nas dikirin berdewam kir. Bîranîn bi dirûsmeyên "Şehîd Namirin" , "Baran

me di nav refên şoreşê de, rakirina wê ya erkan gelekî girîng e. Bi taybetî ji bo avakirina pêşeroja xwe cihgirtina jinan û ciwanan gelekî girîng e"

Fatme Mihemed bi bîr xist ku Baran Serhed ji bo pêşxistina şoreşa Rojava û birina şoreşa gelparêz û demokratîk ber bi sosyalîzmê ve têkoşin kiriye û wiha berdewam kir, "Ji bo şoreş bê veqerandin sosyalîzmê, ji bo hîna zêdetir parastina destkeftinên demokratîk ên şoreşê, hîna zêdetir tevlibûna gel gelekî girîng e. Divê gelê me deriyên xwe ji şoreşê re vekin. Divê em li hemberî rêbazên şerê taybet bibin parêzvanên xeta welatparêziya sosyalîst."

Di bîranînê de Endamê Komîteya Nevendî yê MLKP'ê Ehmed Şoreş û fermanîdar Firat Newalê ku di 3'ê Çileyê 2023'an de bi êrîşeke hewayî ya dewleta Tirk şehîd ketin hatin bi bîr anîn. Di axaftina ku hat kirin de hat gotin "Rêheval Ehmed û Firat di jiyana xwe de parêzvanê xêzê bûn. Jiyana xwe nezirî şoreş û sosyalîzmê kirin. Erka herî bingehîn ku dikeve ser milên me bûyîna parêzvanên ev xeta ku rêhevalên me bûn pêşengên wê."

Beşdarên ku tevli bîranînê bûn jî mafa axaftinê girtin û Baran Serhed bi bîr anîn, dan xuyakirin ku wê di parastin û pêşxistina şoreşê de rêya wan bişopînin.

parastin û pêşxistina şoreşa xwe bigêhêjin sosyalîzmê."

Di bîranînê de berdefka Ciwanên Komûnîst ên Şoreşger (CKŞ) Destan Serhed axivî. Destan Serhed di axaftina xwe diyar ku Baran Serhad ji Patnosê heta şoreşa Rojava dîrokeke girîng nexşandiye û bangewaziyeke wiha li ciwanan kir "Dem dema xwedî lê derketina nirxa şehîdan e, dem dema xwedî lê derketina gelên me ye, ciwan pêşeroj, pêşeroj sosyalîzm e." Di bîranînê de endamê Meclîsa TKŞ'ê Ehmed Xidir di axaftina xwe de wiha got "Şehîd rêya me ronî dikin. Rojava axa me ye em ê bernedîn". Di bîranînê Helbest û stran hatin xwendin.

KOBANÊ

Di bîranîna ku li bînayeta TKŞ'ê hat lidarxistin de salona bîranê bi sûret û lafiteyan hat xemilandin. Bîranê bi rêzgirtinê destpê kir û piştî wê sînewîzyon hat pêşkeşkirin.

Hesen Yusif li ser navê komûnîstan axivî û Yusif di axaftina vekirinê de gotina Baran Serhed a "girêdana şehîdan ne gotin e,



çalakî ye" bi bîr xist. Yusif da xuyakirin ku ev gotin tê wateya bilindkirina ala têkoşînê û azadiyê ya şehîdan û tê wateya pêkanîna armanc û xeyalên şehîdan.

Yusif di axaftina xwe de bi bîr xist ku Baran Serhed pêşengtiya hemleyên "Ez Naçim" , "Xwedî li Federaliyê Derkeve di komînan de bi rêxistin bibe" û "Deriyên malên xwe ji şoreşê re vekin" kiriye. Yusif axaftina xwe wiha berdewam kir "Baran Serhed şoreşgerekî xêzê bû, wî her tim xêza partiyê xwe pêş xist. Li gorî nêrîna rêheval Baran rizgariya dawînî ya gelê Kurd girêdayî xeta welatparêziya sosyalîst e."

Yusif di axaftina xwe de li tevahî gelan bangewazî kir û got "Ji bo parastina şoreşê xwedî li şehîdên xwe derkevin. Ji bo pêşvebirina şoreşa me rêya şehîdan bernedîn. Ji bo avakirina sosyalîzmê ramanên Baranan û Ehmedan bişopînin." Di bîranînê de li ser navê TKŞ'ê Mîrza Berxo axivî. Berxo di axaftina xwe de wiha got "Rêheval Baran rêberê komûnîst ê Rojava bû. Weke şagirtên rêheval Baran em ê bibin şopdarên xeta welatperêziya sosyalîst. Em hevî dikin ku wê gelê me xwedî li vê xetê derbikeve. Şagirtên wî, wê xeta komûnîst baş nas bikin û bibin şopdarên wê.

Bîranîn bi dirûsmeyên "Şehîd Namirin" û "Baran Serhed Nemir e" bi dawî bû.



Serhed Nemir e" qediya.

QAMIŞLO

Komûnîstên Rojavayî, ji bo salvegera Baran Serhed li bînayeta TKŞ'ê ya Qamişlo bîranîn lidar xist. Cihê bîranînê bi sûretên şehîdan hat xemilandin. Bîranîna ku bi rêzgirtin û sînewîzyonê dest pê kir de li ser navê MLKP'ê Fatme Mihemed axivî. Fatme Mihemed di axaftina xwe de diyar ku Baran Serhedê ku di 23'ê Adara 2019'an de ji aliyê îstixbarata Tirk ve hat qetilkirin ji şoreşa Rojava re rêbertiya xwe berdewam dike.

Fatme Mihemeda ku bal kişand ser êrîşên dewleta Tirk a faşîst û dewletên herêmê yên paşverû diyar kir ku ev hêz bi êrîşên dagirkeriyê û teknîkên şerê taybet hewldana tesfîyekirina şoreşê didin. Fatme Mihemed axaftina xwe wiha berdewam kir "Li dijî şerê taybet sîleha herî mezin parastina xeta şoreş û welatparêziya sosyalîst e. Cihgirtina gelê



HESEKÊ

Li Hesekê bîranîna ku li bexçeyê xwendinê hat lidarxistin di şexsê şehîdan de bi deqek rêzgirtin destpê kir.

Di bîranê de Fadya Sîdoya ku yek ji nûnerên TKŞ'ê ye mafa axaftinê girt û di axaftina xwe de di şexsê rêberên komûnîst Baran Serhed û Ehmed Şoreş de tevahî şehîdên azadiyê bi bîr anî. Fadya Sîdo bi bîr xist ku Baran Serhed 5 salên ji 30 salên xwe yê şoreşger li Rojava derbas kiriye û dewleta Tirk a faşîst bi vê êrîşê xwest ku vîna MLKP'ê bişkîne. Fadya Sîdo di axaftina xwe de bal kişand ku piştî vê êrîşê her kadroyek MLKP'ê hedefa "Baranbûyîne" daniye pêş xwe.

Fadya Sîdo di berdewamiya axaftina xwe de da xuyakirin ku wan hedefa birina şoreşê ya ber bi sosyalîzmê ve danîne pêş xwe û bi bîr xist ku Baran Serhed û Ehmed Şoreş di avakirina Saziya Yekîtiyê û Piştgiyariya Gelan (SYPG) de, avakirina FOC'a Elîşêr Denîz û Tevgera Komûnîst a Şoreşger (TKŞ) de rolên gelekî girîng lîstin e. Fadya Sîdo axaftina xwe wiha domand "her du fermanîdarên me yê sor ji bo vîna partiyê canê xwe fidakirin, em ê jî ji bo

Ne Erdhejê Pergala Kedxweriyê Ya Kapîtalîzmê Kuşt

Erdheja ku di 6'ê Sibatê de li bajarên Bakurê Kurdistan û bajarên Bakurê Rojava yên Sûrî pêk hat vejeriya komkujiyekê. Zarok, jin, kal û pîr bi hezaran kes di bin kavilan de man. Li Rojhilata Navîn, heya li cîhanê yek ji karesatên herî mezin hat jiyîn. Erdheja bi pileya 7,6 û 7,7 ku li bajarokên Pazarçix û Elbîstanê ya Mereşê çêbûn bû sedema hilweşîna bi hezaran bîneyetan. Li gorî reqemên fermî yên ku dewletê di 15'ê Adarê de ragihand hejmara miriyan 50 hezar derbas kir. Ji bo ku dewletê bi rojan grûpên lêgerîn, rizgarkirin û alîkarî neşand gel bi hewldanên xwe yên şexsî nêzmêrîvên xwe ji bin kavilan derxist û veşart. Ji ber vê yekê di rastiye de reqema miriyan ji ya ku hatiya ragihandin hîna zêdetir e. Hejmara birîndaran bi sed hezaran e.

Erdheja ku li 11 bajarên Tirkiye û Bakurê Kurdistanê bibandor bû, jiyana 13 mîlyon mirovan serûbinî kir. Li hin bajarên bîneyetên saxlem nema. Bi wateya rast bajar bi erdê re bûn yek. Ji bajarok û gundên ku bi rojan agahî nehat girtin piştî çend rojan agahiya bi hezaran miriyan hat. Bajarên ku bi sed hezaran kesan lê dijiyan wêran bûn. Mirovan erdhej di nivî şevê de jiyankirin. Di bin her bîneyeta ku hilweşîya de bi dehan malbat man û jiyana xwe ji dest dan. Piştî erdheja duyemîn rûxan hîna mezintir bû. Ji bo ku bi hezaran mirovên ku di bin kavilan de man nehatin rizgarkirin ji ber sermê an jî ji ber tîbûniyê mirin.

Bîlançoya (encam) biêş a erdhejê her roj hîna girantir bû. Ji ber ku desthiladariya AKP û MHP bi lezîngî dest bi xebata rizgarkirinê nekir. Alîkariya gel nekir û bi



ser de jî hewldana astengkirina hemleyên alîkariyê ku gel da destpêkirin da. Xiradên alîkariyê ku partiyên siyasî û rêxistinên girseyan şandin herêmên erdhejê asteng kir. Erdheja mezin ên ku di sala 1999'an de li herêma Marmarayê, erdheja ku di sala 2011'an de li Wanê çêbûyê wek duh tîn bîra me. Erê bajarên Bakurê Kurdistanê û Tirkiyê li ser xeta erdhejê avakirî ne. Di salên derbasbûyî de jî bi hezaran mirovan ji ber erdhejan jiyana xwe ji dest dan. Encax ji bo ku dewleta Tirk ji van êşan encam dernexist û tedbîr negirt bû sedema komkujiyê hîna mezintir. Şefê faşîst Erdoğan qet bêfedî derket pêş kemîratan û got ev "qeder" e û derewa "dewlet alîkarî ji mirovan re dibe" got.

Berpirsiyarê encama biêş a erdheja 6'ê Sibatê desthiladariya AMP-MHP û polîtîkayên wan ên kedxwariyê ne. Ev desthiladiya ku ligel ku dizanîbûn wê bîneyet hilweşîn dîsa jî kesên ku van bîneyetan çêdikin re zagona "afûya avahiyân" derxist berpirsiyarê ve komkujiyê ne. Desthiladariya ku çav li çêkirina bîneyetên ji bo erdhejê neqewîn û bê tedbîr in girt, ligel tevahî şiyarkirinên pisporan a erdhejê tedbîr negirt. Qebûlîkirin ku bi "derîbeya erdhejê" ya ku bi salane ji gel distîngîrê û asphalt zift çêkirin. Bi ser de jî ev di qadên hilbijartinan de weke mizgînî ji gel re daxuyandin. Şaredariyên AKP'ê bê denetim ruxsat firotin mutehîdên AKP'yî. Di salên dawî de piraniya bîneyetên ku şerîkeyên ku alîgirên AKP'ne çêkirin hilweşîyan. Nexweşên ku di nexweşxaneyan de ji ber ku bîneyetên nexweşxaneyan hilweşîyan jiyana xwe ji dest dan.

Li qadên çandinî, qadên şîn, li ser avzêlan, li keviyên deryayan, li qadên daristanî çêkirina avahiyân serbest kirin. Xweza ne li gorî sûda gel, li gorî berjewendiya pergalek talankar nixandî. Gotinên mirovên zanîstiyê paşguh kirin. Li qadên avahî û enerjîyê de kontrola odayên pîşeyan ji holê rakirin û bûn dijminê kesên ku îtirazkirin. Desthiladariya Erdogan ku rûxana ku gel jiyana kir nedît destpêka 3 rojan bi gotina "her tişt di rê de ye" gel xapand. Sê rojan alîkarî neşandin bajarên ku tê de bi hezaran bîneyet hilweşîyan. Gef li gelê ku pîrsa "dewlet li kuderê ye, çima alîkariya me nayê kirin" xwerin. Gotina rastiyan weke sûç hesabandin.

Erdhejê rûxand, desthiladariyê qetil kir. Pêşlêgirtina Bandorên wêranker ên erdhejê gengaz e. Bes desthiladariyên ku li berjewendiyên gel difikirin amadekariya ve yekê bikin. Piştî erdhejê derhiladariya Erdogan berpirsiyarî ranekir. Serlêdanên riyalî li herêma erdhejê kirin. Li ser êşa gel xwe bi derewan ve girt û hewl da ku derhiladariya xwe rizgar bike. Careke din derket holê ku kapîtalîzm pergaleke

spartiye berjewendiya dewlemendan, talan û kedxwariyê ye. Piştî erdhejê bi girtina çen mutehîdan hewldana weşartina sûçdarên esasî dan.

Li tevahî bajarên ku erdhej çêbûye gel li hemberî dewletê serî rakirin. Gel bi derfetên xwe hewldana kavilan da. Dewleta ku polîtîkayên şer, komkuji û kedxwariyê berdewam dike dema ku dor hat rizgarkirina gel di fergêhê de ma. Bi salan bi mîlyaran pere herinakandin AFAD'ê (Saziya Lêgerîn û Rizgarkirinê). Lê hat dîtin ku tu grûpên wan ên li ser vê mijarê perwerdekirî tune ye. Dewleta Tirk ku bomberana ku çiyayên Kurdistanê, axên şoreşa Rojava baş dizane li dewsa rêxistinkirina xebata lêgerîn û rizgarkirina gel û rakirina kavilan rewşa awarte îlan kir. Ji hêrsê gelê ku li benda alîkariyê ye tirsîya.

Tenê şoreşger, komûnîst, welatperêz û mirovên xwedî vîjdan birînen gel dermankirin. Ji roja yekemîn de bi hemleyên alîkariyê bi sedan tirimpêlan xiradên alîkariyê hat şandin herêmên erdhêjê. Di serî de endamên HDP û ESP û endamên gelek partî û rêxistinên şoreşger bi gotina "Niha dema piştgiriye ye" ji bo alîkariyê seferber bûn. Weke dildar çûn herêmên erdhejê û ji bin kavilan mirov rizgarkirin. Rêxistinên ku ji bo alîkariyê li Ewropayê hatin avakirin piştgiriyeke mezin pêşkeş kirin. Feraseta faşîst a AKP û MHP ji alîkariya şoreşgeran, ji dermankirina şoreşgeran aciz bûn, dest danîn ser navendên alîkariyê, lê ligel ve yekê xebatên alîkariyê berdewam kir.

Li herêma Bakurê Rojava ya Sûrî, Efrîn, Îdlîp û Azezê jî rûxaneke mezin hat jiyîn. Bi hezaran kesan jiyana xwe ji dest dan. Li bajarokê Cindirêsê ya Efrînê ku di bin dagirkeriya dewleta Tirk û çedeyên wê de ye tu bîneyetên saxlem nema. Ne dewleta Tirk û çeteyên wê ne jî hikûmeta Şamê dest dirêjî gelê mexdûr ê erdhejê nekir. Li bajarên Bakurê Sûrî û Rojava konên alîkariyê hatin vedan. Karwana alîkariyê ya ku Rêveberiya Xweser şand herêma erdhejê hat astengkirin. Alîkariyên ku hatin şandin herêma Şêx Mexsûd, Eşrefiyê û Helebê ji aliyê hêzên hikûmeta Şamê ve bi rojan hat sekinandin. Bûn sedema mezinbûna êşa gel û rûxana erdhejê.

Xwediyên pergala kapîtalîst ji bo alîkariya gelên bîndest tu gav navêt. Lê şoreşgeran bedel dan ber çavan û piştgirî mezinkirin. Bi saya vê îsrarê bi hezaran kes ji mirinê hatin rizgarkirin, rûyê esasî yê dewleta burjuva careke din eşkere bû. Weke ku rêberê mezin Ernesto Che Guevera gotibû "Piştgirî zerafeta bîndestan e" Em ê birînen gel bi piştgiriye derman bikin. Em ê pergala kapîtalîst ku derveyî fêda xwe tiştêkî nabîne bi erdê re bikin yek. Her şoreşa Rojava pêş bikeve û mezin bibe wê pergala wan a kapîtalîst serûbinî bibe û mirovahiyê wê sosyalîzm rizgar bike.

Tîrojên Mehabadê

Di sedsala 20'emîn de li parçeyekî biçûk ya Kurdistanê dewleteke Kurd a bi navê Mehabad ava bû. Qazî Mihemed weke rêberê Mehabadê, evîndarê Kurdistan û têkoşerê azadiyê ji bo Şoreşa Rojava ji bû ronahiyek. Qazi Mihemed di sala 1900'an de li Mehabad de ji dayik bû. Ew azadîxwez û rewşenbîr bû. Çend caran ji bo naskirina sîstema sosyalîzmê çû Yekîtiya Sovyetan û sîstema sosyalîzmê di cihê xwe de nas kir. Ramana sosyalîzm û xwesteka Kurdistanê azad di kesayeta Qazi Mihemed de gihastin hev. Xwedî exleqeke jiyana hevpar bû. Li

operayê 'Dayika Niştîman' bû. Di operayê de dayikekê temsîla welatê Kurdistanê dikir. Ew dayik ji aliyê mirovekî ku temsîla dewletên dagirker dikir ve dihat revandin. Piştî ji aliyê her sê zorakên xwe yên ku temsîla her parçeyekî Kurdistanê dikir ve dihat rizgarkirin. Vê şanoyê li ser gel bandoreke pir mezin çêkir. Piştî operayê tevlibûna gel a komelê hîna zêdetir bû. Di 22'ê Çileyê 1946'an de Qazî Mihemed bi rêhevalên xwe ve derket Qada Çarçira. Di wê rojê de qada Çarçira ew qasî qelebalix bû ku piştî salan jî şênîyên

Rojnameyeke fermî ya bi navê "Kurdistan" hat derxistin. Dibistana pêşî hat mecbûrî kirin. Di dibistanê de zimanê perwerde Kurmancî bû.

Ji bo perwerdekirina artêşa Mehabadê Sovyetan hinek fermanên xwe şandin Mehabadê. Xwendekarên peymanekê perwerde kirin û ji bona vê nêzikî 60 xwendekar çûn Bakû. Saziyan çand û hunerê hatin avakirin. Şeweya rexistinkirina ciwanan û jinan ji Sovyetan mînak girtin. Bi Yekîtiya Sovyetan re bazirganiya titûnê çêbû. Di 23'ê Avrêla 1945'an de bi Dewleta Meclisan a Azerîyan re hevpeymanekê piştgirtiyê hat çêkirin. Li gorî vê peymanê wê her du gel hev du biparêzin û ji bo parastina sînor, di aliyê bazirganî de hevkarî bê kirin.

Di nav 11 mehan de Komar ji gelek aliyan ve mezin bû. Lê belê di wê pevajojê de dewletên emperyalî dorpêça xwe girantir dikirin. Dewleta Sovyetan li gorî peymanê ku bi Îngîlîzan re çêkiriye mecbûr ma û hêzên xwe yên li wê herêmê vekişand. Di despekê de Dewleta Meclisan a Azerîyan di aliyê dîplomasiyê de têk çû û ket bin kontrola rejîma Îranê de. Piştî têkçûna dostên xwe, Mahabat hîn bêhtir tenê ma. Qazî Mihemed fêhm kir ku di pêşeroja Komarê de zehmetiyeke mezin heye. Hinek rêberên eşîran jî xwe paş ve kişandin an jî bûn koçbêrên Dewletên Sowyetan. Mele Mistefa Berzanî ji ket rêya koçberiyê zor û zehmetî. Lê belê Qazî Mihemed li Mehabadê ma û dema ku rejîma Îranê ya mêtînger diket axa Mehabadê li hemberî hêzên Îranê serê xwe netawand û li ser piyan derket pêşîya wan. Di 13'ê Kanûna 1946'an de Qazî Mihemed ket destê rejîma Îranê. Qazî Mihemed û çend rêhevalan wî derxistin dadgehên leşgerî. Li vir jî Qazî Mihemed Komara Kurd a Mehabadê parast. Lê belê acizbûna rejîma Îranê ji Qazî Mihemed pir mezin bû. Ew bû ku hikmê Îranê nas nekir, ew bû ku ji bo Kurdistanê azad gelê xwe rêxistin kir, ew bû ku bû pêşangê avakirina komara Kurdistanê. Ji ber vê yekê Qazî Mihemed û rêhevalên xwe Di 31'ê Adara 1947'an de li Qada Çarçira ji aliyê hêzên Îranê ve hatin îdamkirin. Serokomar Qazî Mihemed, Serokê Desteya Şer Mihemed Hisên Seyfî xazî û Sabrî xazî bûn nemirên Kurdistanê azad. Wan canê xwe ji bo pêşeroja gelê Kurd û hevgirtina gelên bindestan fida kirin.

Weke wan rojên ku Qazî Mihemed çawa ku bi dildarî welatê xwe parast em ê jî îro weke wî, bi rihê Xaziyan şoreşa Rojava biparêzin û mezin bikin.



wekhevî û piştgiriya gelên bindest bawer kir.

Ji bo Kurdistanê azad weke têkoşerekî vîndar, dilbawer û bibiryar heta lêdana dawîya dilê xwe bi azwerî têkoşîya. Hem gelên Mehabadê, hem jî eşîrên Kurdên derdorê ji sekna Qazî Mihemed pir bandor bûn û tevî têkoşîna şoreşa Mehabadê bûn. Di nav wan de yek jî Mele Mistefa Berzanî bû. Mistefa Berzanî li Iraqê rabû serhildanê, piştî serhildanê xwe paş ve vekişand. Di wê heyamê de Qazî Mihemed nas kir û bi teva hêza xwe ya çekdarî li cem Qazî Mihemed şer kir.

Di dîroka 25'ê Tebaxê de dewleta Emperyalîst ya Îngilîz Başurê Îranê dagir kir. Dewletên Sovyetan jî li dijî dewletên emperyalîst hinek herêmên Îranê xist bin kontrola xwe. Di dîroka 16 Îlona 1942'an de rêxistina Komela Ziyawêyê Kurdistan (Komel) hat avakirin. Heta sala 1945'an endamên rêxistina Komelê zêde bûn. Di meha Adara sala 1945'an de Komelê operayî (şanoyên bistranî) lidar xist. Ew şano bi zimanê Kurdî tê nivîsandin û bahsa dagirkirina Kurdistanê dike. Navê

Mehabadê hîna behsa wê rojê dikirin. Qazî Mihemed bi cilên leşkerî yên Sovyetan û bi li serê girêdana serpêça nîşana qazitiyê Komara Kurd ya Demokratîk îlan kir. Qelebalixê bi coş û kelecana, bi hesreta Kurdistanê azad qada Çarçira geşkirin. Piştî damezrandinê, Meclîs hat avakirin û di hilbijartinê de Qazî Mihemed weke serokomar, Hacî Baba weke serokwezîr û Mele Mistefa Berzanî weke serkanê giştî ya artêşê hatin hilbijartin. Sirûda (Merşa) neteweyî helbesta Hejar a bi navê 'Ey Raqib' bû. Bajarên komarê Senendec, Şîno, Malyondoab Pîranşar, Naqada ve Ushnaviya bûn û Mehabad jî weke paytaxta komarê hat diyar kirin.

Artêşa Xweser ji nêzikî 1200 leşgeran pêk dihat û cilên artêşê yên fermî cilê artêşa sor a sovyetan bû, Zimanê komarê yê fermî Kurmancî bû. Ala komarê wiha bû: li ser şerîta sor, sipî û kesk tav, simbila genim û pênuşek hebû. Sovyetan di despêkê de nêzî 5.000 çek şandin û vê piştgiriya gav bi gav berdevam kir. Matba û stasyoneke radyo şandin û piştê wê radyoyê Mehabadê dest bi weşanê kir.

Ji Rêheval Baran Heta Rêheval Ehmed Xêza Komûnîst

Rêheval Baran û Ehmed li Tirkîyê û Kurdistanê bûn pêşeng û rêberên xeta komûnîst. Derbeya leşgerî ya faşîst a 1980'an komkujîyeke mezin, êrîşeke ku dijminê her tiştê şoreşger, pêşverû ya tune kirinê bû. Piştî derbeyê bi salên dirêj pêvajoyeke bêdengî, çavtirsînî û ya koçberiya Ewropayê çêbû. Elbet weke ku pêvajoyeke têkçûnê bû, di heman demê de pêvajoyeke berxwedan û bedelên mezin bû jî. Sala 1987'an ji nû ve bû destpêka bilindbûna têkoşîna şoreşger. Pêvajoya heyama şoreşger ku bi berxwedana zindanan ji nû ve derbasî bilindbûnê bû, di destpêka sala 90'an de bi taybetî li Kurdistan û Tirkîyê dibe heyama serhildanan û çalakiyên mezin ên girseyan.

Rêheval Baran û Ehmed hîna di salên xwe yê ciwan de rêberên ciwanan ên nifşa serkeftinan in. Ew Mîlîtanên ku serî natewînin ên têkoşîna li dijî faşîzmê, di lêpirsînê bi şkence de serbilind derdikevin. Ev du rêberên ciwanan ku berxwedana xwe tena di dezgehên şkenceyan de sînardar nakin, bi cih girtina refên herî pêş ên têkoşînê de, ne weke nûnerên têkçûnê weke nûnerên nifşa serkeftinan mohra xwe li dîrokê dixin. Ew, li dijî tengbûn, xwe jiyandin û qutbûna ji armanca şoreşger di nav partiyê xwe de bûn parêzvanên yekîtiya komûnîstan ên herî mezin û bûn kadroyên damezrêner



ên şoreşa yekîtiyê. Şoreşa yekîtiyê tena dawî li parçebûna di refên komûnîs nanî, di heman demê de bû gava nû û mezin a armanca şoreşê.

Taybetmendiyên wan ên hevbeş û veqetîner xweşbîniya şoreşger, îdîa, girêdana şoreşê, bawerî û bi kêfxweşîyeke mezin ked dayina van e. Ew şoreşgerên kêfxweş û bi hêvî ne. Ev hindaveke veqetîner e ji ber ku; girêdana xwe ya komûnîzm û şoreşê, têkoşînên xwe bi qutbûneke gelekî mezin a ji pergala paşmayî meşandin. Ew du rêberên kadro yê li dijî pêwendiyên xwe yê xuya û nexuya yê bi pergala paşmayî re têkoşîneke bi dîsîplîn, vîn û kedê hatiye eciqandin in. Gotina rêheval Ehmed a "Divê tu nebe koleyê tu tiştî" di kesayeta wan de bûbû cisim.

Dîsîplîna wan di jiyana rêxistinî de, sadebûn, kedkarbûn û biryardariya wan a li hemberî her cure oportûnîzmê (helperestî) şêweya zelal a nêrîna partiyê Lenînist e. Di milê hevgeriya gotin û çalakiyê de bawerîyeke mezin bi her du rêhevalan tê anîn. Ji ber ku çalakiya wan ji gotina wan, gotina wan ji çalakiya wan tê. Li cihê ku ew jiyandin dikin belawelatî, bêserîtî, jiyaneke ferdperestî nayê fikirîn. Ew di nav partiyê de avahîsazên (mîmar) rast şixulîna sîstema partiyê, rexne û rexnedayin, pêşketin û hedefên rêxistinî ne. Xwe derveyî jiyana rêxistinî ku têkoşîna wê didin meşandin nagirin û dibin pêşnimûneyên rêhevalên xwe.

Gelo wê rêyeke nû bê vekirin? Rêheval Baran û Ehmed bêyî bidudilî avaker û pêşengên wê ne. Ger gavên wan bê şopandin, li bajaran ji têkoşîna rewya, heta îlegalîte (karê veşartî yê partiyê) ji avakirin û pêşxistina rêxistinên leşgerî heta rêxistinkirina şoreşa yekbûyî û li Kurdistanê pêkanîna xeta welatperêziya sosyalîst, ji rêxistinkirin û mezinkirina ramana şoreşa herêm û şoreşa cîhanê li her derê rastî şopa wan tê hatin. Ew li erkên biçûk û mezin nanêrin, li cihekî gul diçînin, li cihekî paqijî dikin, li cihekî şervanan perwerde dikin, li cihekî di refên herî pêş de şer dikin, li cihekî dibin şervan. Dema ku fêr dikin fêr dibin, dema ku fêr dibin fêr dikin. Li cihê ku ew tê de ne pirs a "gelo ez dikarim bi ser bixim" nayê pirs kirin, bi biryardariyeke mezin serkeftin tê rêxistinkirin.

Pêşketina bîrdozî, nezerî û têkoşîna polîtîk

a partiyê û şoreşê her tim di rojeva wan de ye. Kêfxweşîya wan a xwendin, şopandina polîtîkayê, pêkanîna ramanan, têkîliya zindî ya ku bi nezeriyê re tê danîn her tim xuya ye. Di van mijaran de xwedî roleke çalak û afirîner in. Têkîliya wan bi partiyê re zindî ye, tu carî xwendina lêserhatinî nakin. Hemû tiştê ku dixwînin di safoka mêjî û bergeha komûnîst re derbas dikin. Di nav tevahî karên xwe de ji bo pêşketina partiyê û rêhevalên xwe kedeke mezin didin.

Ew bûn du rêber û nûnerên girêdana partî, şoreş û xeta komûnîst. Dema ku rêheval Baran şehîd dikeve rêheval Ehmedê ku erka wî digire bi ked û bawerîyeke mezin dimeşe. Hûn nikarin di navbera heyama berê û rêheval Ehmed de valahiyek an jî tewîşenekê bibînin. Meşa di xeta partiyê de hîna mezintir û kûr dibe. Bi rêbertiya rêheval Ehmed li dijî tesfîyekariyê têkoşîneke mezin tê meşandin. Dema ku hûn li wan dinêrîn hûn rêber û pêşengên mezin ên têkoşîna girêdayî jiyaneke komûnîst, xeyala avakirina cîhaneke komûnîst dibînin. Ji ber ku wan weke ku fikirîn jiyandin kirin û ji me re mîrasekî mezin ê komûnîst û şoreşger hiştin. Gotina rêheval Ehmed a "Ez ji îro de komûnîzmê jiyandin dikim û ji ber vê ez pir kêfxweşî im" vê rastiyê xulase dike. Gîhaştina me ya komûnîzmê wê bi şopandina şopa lingên wan gengaz bibe.



لم يقتل أي زلزال نظام العمل في الرأسمالية



